HEVDEM

FESTÎVALA AMÊDIYÊ PÊNGAVEK NETEWEYÎ BÛ

Evîn Tahir Hirorî

Pêşketina milletan di warên cuda cuda de, bi astê azadiya wan ve girêdayî ye. Em milletek in ku pirraniya me, ji blî zimanê zikmakî, zimanek din jî dizanin ku ev jî vedigere bo wê zulma ku bi dirêjiya mêjûyê li milletê me hatiye kirin û nehêlayî em bi azadî bijîn û berdewam hewl dane ji bilî dagêrkirina erdê me, ziman, dab û nerît, dîrok û cilkên xwe jî bi ser me de bisepînin, gundên me wêran bikin. Ev kiryar e jî bûne eger, yan xelkê me berev welatên cuda cuda biçin, yan jî qesta bajêran bikin û bi dabînkirina pêdiviyên jîyanê ve mujûl bibin û peywendiyên civakî lawaz bibin û di encam de roj bo rojê folklorê me berev berzebûnê biçe ku ev e jî diyardeyek metirsîdar e, ji ber ku folklor nasnameya milletan e û şûnwarên dagêrkirina folklorî, zû bi zû, ji nav naçin. Bo nimûne; piştî şerê azadiyê, erdê me azad bû belê, hêj xelkê devera Şingalê cilkên erebî li ber xwe dikin, lewma jî, ya fer e ku ji bo nehêlana vê diyardeyê hindek pêngavên praktîkî bihên havêtin da ku

hişiyariyek di nav xelkê de, bi taybet gencan, çêbibe û bibe rêkek folklorê xwe biniyasin û pêgîriyê pê bikin.

Ew festîvala li rojên (17 - 18-yê Nîsanê) li Amêdiyê hatiye gêran, pêngavek neteweyî û destpêkek pîroz bû ji bo vê meremê ku di nav de gelek tiştên girêdayî û taybet bi neteweya me ve hatin nîşandan wek xwarnên kevn, corên ciyawaz ji cilkên jin û zilaman, hunerê millî, berehîkane û yaryên folklorî, rêresmên çewayiya bûk veguhaztinê û heyranok û stiranên koçk û dîwanan hatine nîşadan. Tiştê serincrakêş, ev bû ku jin di pitiriya van çalakiyan de pişkdar bûn ku ev jî nîşana hindê ye, jina kurd di kevn de azad bûye û bawerî bi xwe hebûye û xebata wê di gelek waran de harîkariya pêşveçûna folklorê kurdî kirî bizavan bihê dan, da ku çand û folklorê resenê kurdî bihê paraztin û li paşerojek nêzîk, gelê kurd bi hemû cîhanê bidin naskirin.